

NEWROZa me Û şivantiya Elo

Serdarê Bedirxan

-
Kekê Reşo, ka hejmara me ya dawî ji Newrozê bi ser hev de nehat, ma ne dema wê nêzîk bûye, xwendevan li benda wê ne?.

- Ho birawo, ho birawo, bawer bike ezê dev ji vî karî berdim, ez nema karim...Hê ji wan berhemên ku te ji min re şandine pê ve, tiştek ji min re nehatiye...Her roj, her şev, ez dengê xwe digihînim wan camêran, ew nivîsên xwe ji min re rênakin...

Bi van peyvan, kekê Reşo goina xwe bi dawî anî.

Eve ne cara pêşîn bû ku hevalê min Reşo dilsariya xwe ji derengiya rojnameyê aniye zimên, gilî gazinên xwe kirine û gotiye “ezê dev ji vî karî berdim”, lê, her ew bi xebata ziman û çanda gelê xwe ve girêdayî ye, ew nikare jê dûr bikeve, tenê, ew kela dilê xwe bi vê gotinê hênik dike. Gotina hevalê min, çîrok şivantiya Elo anî bîra min, ezê wê ji xwendevanên Newrozê re pêşkêş bikim:

Dibêjin, li devera Botanê, şivanekî qewlek bi gundekî re danî ku ew şivantiya wî gundî bike, dem derbas

bû, qewlê şivên nêzîk dibe, wî ji gundiyan re got: Eve qewlê min û we nêzîk bûye, bi hêvî me hun ji xwe re şivanekî din bibînin, ji ber ku ez nema li gundê we şivantiyê dikim. Hingî şivan mirovekî dilsoz û qenc bû, guh li pezê gundiyan dikir, baş ew diçêrandin, li ser destê wî pez qebilî û qelew bûbû, destê gundiyan jê nedibû, hema jê re digotin: Em li şivanekî digerin, ku me dît, oxira te ya xêrê be, lê, di rastiyê de, ew li tu şivanan ne digeriyan. Roja qewlê şivan bi dawî dibû, bang dikir: Gundîno...!! tu kes pezê xwe bernrde, qewlê min qediyaye, ez nema diçime ber pêz, dihate xanîkê xwe, di kulekê re li benderan temaşe dikir ka gelo wê gundî pez berdî yan na. Gundiyan, pez berdida ser benderan û vedigeriyan malên xwe karên xwe dikirin, ewî didît ku mih, bizin, kehrik... virde dibezin, wired dicing, ziyanan dikin, hin dikevin nav nîskan, genim, ceh û nehkan... Bi lez û bez wî careke din radihişte darê şivantiyê, bê vîna wî, rojeke nû ji qewlekî nû dest pê dikir...!!

11.07.2008Z-2620 K

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê
Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de*